



Australian Government

Department of Health

Hacetekî nû bo alîkirina hêdîkirina belavbûna COVID-19

COVIDSafe app hacetekî nû ye bo alîkirina hêdîkirina belavbûna vîrosa korona li Australya, ligel têtstkirinê, pakiya baş û jihevduyîyê.

COVIDSafe app tenê bo tenduristiyê ye. Ew ê bo selametiya australiyân alîgir be, bi rêya bezakirina proseya agahdarkirina kesên temas (têkilî) bi kesekî bi vîrosa korona ketî re hebûye. Mamûrên tenduristiyê yê hukûmeta wîlayetê yan herêmê dê peywendiyê bi te re deynin ger îmkana rûbirûhatina te bi vîrosê re hebe û dê te agahdar bikin:

- ka divêt derbarê çî de miqayit bî (ka çî dikare biqewime)
- ger xwe-cihêkirin (*quarantine*) bo te divêt
- çawa, kengê û li ku xwe têtst bikî, û
- çawa xwe û malbata xwe biparêzî.

Bidestxistina *app* bi daxwaza mirov e (ne îcbarî ye) û bêpere ye. Dikarî *COVIDSafe* ji *app store* bi dest xî. Nivîsandina van agahiyan dê ji te bihêt xwaztin: navekî, jimara telefonê, koda postayê û ka tu di navbera çî temenan de yî (salên te). Van agahiyan dikevin sîstêma e'nbareke data (agahiyan) ya gellekî parastî û ji bo ragîhandina koda referensekê dihên bikarhanîn.

App di hindirê telefona te de karê xwe dike dema tu jiyana xwe ya rojane didomînî. Teknolojiya bi navê *Bluetooth* bi kar dihîne bo dîtina *App*ên din. Bi şêweyê nixamtî û bi ewlehî peywendiyê bi kodên referensên karhênerên *app*ên din re dike, ku yê kesên tu nêzike wan î, û rojê, demê, mesafetê û dirêjiya temasê (têkiliyê) qeyd dike.

Şûnê qeyd nake.

Ev agahiyên bi encama hevnezikbûnê hatine girtin (înfomasyona *app* digire) dihên şifrekirin û dikevin nav *app*a di telefona te de. Heta tu bi xwe jî nikarî wan ji telefona xwe bi dest xî.

Agahiyên bi encama hevnezikbûnê hatine girtin tenê 21 rojan di nav *app*ê de dimînin. Ev dem rê dide bixwehatina (tekamilbûna) vîrosê ku jê re 14 roj divên. Ev dem her weha ji bo îspatkirina hebûna encameke erênî (hebûna vîrosê) li dû têtstkirinê divêt. Agahiyên (înfomasyona) ji 21 rojan kevntir xwe bi xwe ji *app*ê dihên derketin.

Ger hebûna *COVID-19* bi te re bihêt şopandin, mamûrên ji wîlayetê yan herêmê dê ji te bipirsin ka tu rojên dawîn bi kê re têkildar bûye. Dikarî bi qayîliya xwe rêdanê bidî wan bo agahiyên di *app*ê de bi dest xî, derheqê kesên tu nêzike wan bûye - di nav metro û nîvekî de (1.5 m) bo 14 xulekan (deqîqe) yan bêtir.

Nuha, dîtina kesên ku belkî bi vîrosê re rûbirû bûne (temas pê re hebûne) xwe dispêre bîrhanîna kesan ka ew bi kê re bûne û ka agahiyên derheqê wan de dizanin. *App* *COVIDSafe* vê proseyê zûtir û hêsantir dike.

Agahiyên di *app*ê de dikarin tenê ji aliyê mamûrên tenduristiyê yê wîlayetê yan herêmê ve bihên bikarhanîn, û tenê bi armanca agahdarkirina ewên têkilî (temas) bi kesekî bi vîrosa korona krtî re hebûye. Bikarhanîna agahiyên di *app*ê de bo mebesteke din kiryareke li dij qanûnê ye.

Dikarî *app*ê û agahiyên wê dema bixwazî ji telefona xwe derxî.

Dema nexweşiya vîrosa korona li Australya bi dawî bihêt, karhênerên *app*ê dê bihên agahdarkirin ku *app* *COVIDSafe* ji telefona xwe derxin. Ev dê hemî agahiyên (înfomasyona) *app*a di telefona kesekî de derxe. Agahiyên di sîstêma e'nbara parastina agahiyan de dê her weha li dû dawîhatina nexweşiya vîrosa korona bihên tunekirin.

Bikarhanîna *appê* dê bi hukûmetê re alîgir be ku gavên dawîdana sînorkirinan (*restrictions*) zûtir bikin, ku dê bi şêweyeke din ne pêkan (mumkin) bûya.

Bo bêtir agahdarî derheqê vîrosa korona û *COVIDSafe app* de, vê malperê veke: www.health.gov.au